الحزب الدستوري السوري

(حدْس)

ديموقراطية – علمانية – مواطنة – تنمية – سلام

**Daxuyaniya ragihandina Partiya Destûrî**

Serhildana gelê Sûriyê di avdar 2011an de giyaneke nû afirand ku doza serdemeke nû li Sûriya ku di bin desthilata dezghên totalter, zordar û sitimkar de ye, kir. Ev dezgeh û serkêşên xwe karûbarên giştî binpê kirin û hemû derftên danûstandinê di navbera xelkên sûriyê de, herwisa pêşketina bingehên civakî û aborî bi zorî têk birin .

Ew jî bi îdyolojiyeke nijadperest û girtî, ku bi wê ne tenê pêşketina dîrokê, lê dîrok bi xwe girtin, hevdem derfetên guhertinê jî jê bê par neman, û Sûrî ji dewleteke netewî kirin dewleteke gendelî. Ji xwe dê desthilatek bi wî rengî li dijî serhildana gel derkeve û dê wê biçewisîne û ji rê derxe.

Serhildana Sûriyan li ser hinek prensîpan tekez kir, ya herî girin yekîtiya Sûriyan û daxwazên hevbeş bi doza yekîtî û rûmetê, bi kurahiya daxwazên di hundirê wan siloganan de di peydabûna rêjîmeke siyasî nû ku bi rengekî demoqrat, pirreng , hemwelatîtî, wekhevî di derfet û xweşguzarî û avakirina pêşvebirina domdar, li paş ku rêjîma navendî hin bajarên sûrî piştguh kirin û bi mêjiyeke îstixbaratî têklî û berjewendiyên xwe pêk tanî.

Hatiye zanîn ku ji bilî rêjîmê hin hêzên hinderîn, herêmî û navdewletî ew kêşe ji rengê wê yê netwî dûr xistin û bûne kelemek li pêşiya dîtina çareserkirineke siyasî, herwisa sedema hemî azarên ku gihane milet, ku ji ber wê jî dengê hin nasnameyên berî netewyî, wek yên herêmî,mezhebî, êlîtî û nasnameyên li jora netewiyetê, wekî ol û qewmiyet bilind bûye. Ev tişt bûn rengek ji rengên domahiya rewşa qefzandinê ya di dîroka sûrî de, ku ji salên 50î ji sedsaliya buhirî de hin partiyên dyolojî ji nasnameya sûrî ber bi netewa erebî, wek wê jî miletê ereb, yanjî olî, wekî miletê mislman, anku navnetewîtî, wekî nimûne" yekîtiya prolîtarya navdewletî."

Rewşa sûrî ya tevlîhev di salên dawî de hin çarçove û koalîsyon û girûp afirand. Wan jî nikarîbû nameyeke ramanî ji pirsgirêkên sûrî re ragihîn in,

tenê bi hin siloganên giştî û armacên demkî, ku ew jî bi alîkariya hin hêzên ji derve di asta yekem de man. Ew serpêhatiya han bê sûdabûna xwe, herwisa daxwazên parvekirina desthilatê, dan xuyakirin.

Hin ji welatiyên sûrî, ku ev dora salekê ye hin mijarên mîna avakirina sûrî ji sala 1920an de û dûrketina wê ji tecrûbeya demoqratî û dûrketina hêzên siyaî ji pênasîna bi miletên ku li sûrî dijîn û hewcedariya sûriya ji rawistandina şer û avakirina welatekî nû gengeşekirin û bi mijara avakirina partiya Destûrî ya siyasî derketin.

Pariya Destûrî, ku hê gavên xwe yên avakirinê tavêje, banga gotina (netewa sûrî) ku pênasînê bi mafê hemû miletên dîrokî li welatê sûrî dike, hewisa nexşeya sûrî ku li gorî lihevkirinên navdewletî hatiye pênasîn jî û dê têkoşînê bike ta vê yekê bi rengekî fermî li ser hemû astan, di çi civînên avakirinê li pêş pêk werîne, ta ku jiyaneke netewî û siyasî, ku tê de desthilata hêzên dêfakto, çi ji rêjîm yan jî mîlîşyayên wê nemîne, ava bibe.

Partiya Destûrî 5 pirensîpan ji xwe re wek bingeh dibîne, ew jî wisa hatina rêzkirin: Demoqrasî, Sekulerî, Hemwelatî, Pêşketin û Aştî, û wan jî dike simbola xwe û weke armanc dê j ibo wan têbikeşe.

Li heman demê Partiya Destûrî berê xwe dide hemû sûriyên ku xwe nêzî van armancan dibînin tevlî nav refên wê bibin, lê pêwîste hemû mercên endametiye li ser pêk werin herwisa dê bixwaze karê hevbeş bi hemû hêzên siyasî û netewî, ku nêzî nêrînên wê yên siyasî ne, bike.

Damzrênerên Partiya Destûrî roja 11/07/2017 weke roja damezirandinê ji xwe re dibîn in û siloganê xwe ya anuha dipejirîn in û soz didin ku kar bikin da kongreyê xwe yê yekem lidar bixin û serkirdeyan û sîstemeke hundirîn ji xwe re hilbijêre.

**Ji bo pirs û têkiliyê:**


- Berpirsê Peywendiyên Derve: husam miro
- constitutionalparty.syria@gmail.com
- 00971509375620